



# ENCÛMEN



Ji weşanên Nivîsgeha çand û Ragihandina Encûmena nîştîmanî kurdî

**Weşanên siyasî - çand - huner - civak - wêje**

**Sernivîs-Yusra Zibêr**

**Lêvegera Ziman- Mihemed Kose**

**Ji bo têkiliyên We bi Me re**

Li ser Amêlê

[Rojname.enks@gmail.com](mailto:Rojname.enks@gmail.com)

**Jmar 6**

مكتب الثقافة والإعلام

# ENCÛMEN

Encûmen

dîrok: 5-9-2018

(1)

Jmar (6)

## Pêşgotin


### Vegera Penaberan

Di van Rojên dawî de Doseya Vegera Penaberan bi hêz hat pêşinyarkirin ji aliyê Rûsyayê û çend Welatên din ve wek ku Şer bi Dawî hatiye bi Serkeftina Rijêmê û hevbendên wê û tiştek nemaye ji bilî Lêbûrîne li Penabera da ku bikarên vegeerî Welatekî tevde Aramî û Aştî ye . Ne yek ji vanên buhûrî hatîye çespendin ta weka niha û Alava kuştin û mişextbûnê berdegame û ne hatî ye rawestandî , lê belê Berûvajî ji vîna tê xuyakirin ku Şer bi berv Gurbûnê ve diçe bi Riya behtirbûna Hêzên Serbazî û deryayî yê Emêrka û Rûsya di Kendavê de û Deriya sipî de . Û li ser vê yekê nahête behwerkirin Pêşinyara Rûsyayê û Hevbendên wê û nexasim Raghandina Elmanî Dengê Hevserne Rijêmê hişkerkir tede Gefa bi kuştinê didin çî yekî vegera Welat heger Pişikdar be di Opezisionê de yan bê Deng rawesta be yan xwe bê layan hiştibe , û heman Helwêst dabû xuyakirin Hefser Leşkerê Esed (Îsam Zehredîn) Payîza Sala bihûrî Hijmara Xwestiyên Leşkeriyê bi tenê bihtirin ji Melyonek û nivê ji Xortan , wê vêçe çawa Behweriya wan bi çî Pêşinyarê bê û Hêzên Esed li Benda vegera wanin da ku Kêmbûna di Rêzên Leşkerê xwede dagre.

Hemî Tiştê li ser Seramserî Sûriyayê dibe em dikarin li ser Kurdistanê Sûrî ji bipîvin ji ber ku Deselata Bas û PYD di Ruyên yek Diravî ne ji ber ku Qedexkirina Azadiyan û Leşkeriya neçarî û Girtin û Binçavkirin kêmnebû di der Mafên çî Aliyê Rêkber be ji Ramyariya wan û Hevbendên wan . Hijmara Penaberan li Welatên Dorawsê û Oropayê bihtirin ji heft Melyon û Nîvan li Gor Serhijmarên Fermî , ev hemî Tevlî Jiyanê xwey nû bûne vêçe wê çî Pêwan bikare Behweriya wan bêne bi vegeerî li Welatekî Parastin û Aramiyê jê barkiriyê , berê û niha jî Yasa Dehlê tede Deselate, û Hêzên Herêmî û Navdewletî Parçên wî li hev parkirine û Kontrol li hemî Navberên Jiyanê kirine . Li ser van Rastiyên bihûrî dibe Armanca Xwediyên Pêşinyara Vegera Penaberan ewe ku çend Nameyan arasteyî Civaka Navdewletî bikin \_ : Bidin xuyakirin ku Şer bi dawî hat bi Serkeftina Rijêmê û bivêna heye ku hesanîtir be kontirolkirina Xaka Welat tevde \_ . Civaka Navdewletî neçarbikin ku bi Rijêmê re bide û bistene û Têkiliyên Doblomatîk pêre vegeerînin wek ji berya Şoreşê ve bûn. \_ ji Oropare bête daxuyanî ku Kilîta Astengiya Penaberan di Destê Rûsyayê deye û evna heye bihêle Lihevkerinek çêbe di navbera wan de li ser Doseyên dîtir giring cihê Nakûkiyî ne navbera Rûsyayê û Oropa de . Di Dawî de Dema ku Berjewendiyên hemî Welat û Hêzên ku Desdtêwerdanê di Sûriyê de dikin bêne çespendin wê hinga bitenê wê Bar cardî bêne girêdan bi berv Welatekîve em nizanin Nefşen ku li Beyaniyê Rabûn wê tu Wateyê ji Navê wî re bibînin yan na?



Dr. Münib Ehmed



## Pêşewa Qazî Mihemed

### (Kurdistan yek parçe ye nabe beçar)

Her wekû Em dizanin dilsoziya Pêşewa Qazî Mihemed bo Kurdistanê Şêrî û daxwaza wî yek parçebûna Kurdistanê û pêşkêşkirina her qurbanîyek ji bo vê dozê, ku canê xwe fidakir ji vê armancê re û hate li sêdaredan ji aliyê rêjîma Ecemî li Meydana Çarçira piştî ragihandina Komara Kurdistanê di sala 1946 de, ku di Helbesta xwe de ya **2+2=1** tekezî li ser yekitiya her çar parçên Kurdistanê dike.

Dibêje:

Li Qutabxanê li me dipirsîn do û do dibe çend hemiyan Digotin: dibe beçar

Lê min di bîrkarî de şikestî tanî tenê ji ber ku bi min du Û du dibe biyek nabe beçar

Bi min wa bû ku diran û du Lêv û Ziman nabin beçar

Lê dibin yek Dev bo Kurdistanê dikin hewar

Bi min wa bû ku du dest û du Ling nabin beçar

Lê dibin yek Laş û pêkve diçin ser kar

Bi min wa bû gerek, Xanî, Kolan û Rê nabin beçar

Lê dibin Bajar tede dijîn dolemend û Hejar Bi min wa Bû Reh, Laq, Şax û Pell nabin beçar

Lê dibin bi Bax tede hene Darê kin û dirêj wekû Çinar

Bi min bû Evînî ,Işq, ciwanî û Pakî nabin beçar

Lê dibin biyar ji bo dildar Ev hemû tiştê du û du dibina Yek nabina çar gelek zorin nayêne jimar tenê ez Dizanim eger Laşê min sad parçe kin û min gulebaran bikin û min bikûjin

Tiştê di Dilê min de li ser Zimanê min e ew jî Kurdistanê min her yeke nabe beçar.

# ENCÛMEN

Encûmen

dîrok: 5-9-2018

(2)

jmar (6)

## Kurd û şoreşa Sûrî Xeleka (3)

Esed mirovekî Xwedêda ye

Kurd dibêjin: ev mirovê ha Xwedêdaya, anku ji layê Xwedê ve bexteware, piştî ku lek û lehî li hev ket û milletê Sûrî rabû ser piya û gelek dewletên cîhanê piştgiriya wî kirin, bi wê hêviya ku wê nêzîk milletê Surî serokkomar û rêcîma wî a Faşîst û hovane bi Sêdaran ve daleqîne, kî bawer dikir ku di navbera şev û rojekê de temenekî nuh ji Beşar û rêcîma wî re werê danîn? Ku destê qudretî (Veto) wê wî ji helakê rizgar bikê. Ji ber ku rêcîmê li dijî şûreşê çareye leşkerî bi kar anî, û çekên giran li dijî xwepêşinderean bikaranîn, ji ber vê hindê daxwaz û vîneke navdewletî

Serhan İsa

hebû ku hinek sizayên dijwar deynin ser rêcîma Sûrî, lê mixabin Rûsiya û Sîn ê, çar caran mafê Veto di encumena Ewlekariya navdewletî de bi kar anîn, di (04.10. 2011), (04. 02. 2012), (18.07.2012), û 23.05.2014 an de Veto ya çaremîn li dijî biryara navdewletî bû a ku dixwest Dosêya Sûrî radestî dadgeha tewanan ya navdewletî bike, lê dîse Veto ya Rûsiya û Sînê ev biryar rawestandî, û bi vê yekê ne tenê Sîgortake nuh dane Beşar û rêcîma wî belê şûreşa Sûrî jî derbasî şikefteke tarî kirin. Rûsiya û Sînê digotin yê me em mafê xwe yê rewa, yê Veto bikartînin daku em rê nedin Emerîka û dewletên Rojava ku destdirêjiyeke leşkerî di Sûrî de bikin. Bêguman çîrok li cem Veto nerawestiya, ji ber ku Iran û Hizb Allah jî derbasî ser xetê bûn, û Sûrî bû qadeke vekirî ji şerekî navdewletî, herêmî û navxweyî re, ku di encamê de bi Dehan gund û bajar wêran bûn, û bi Sedhezaran milletên Sûrî penaber û koçber bûn. Herweha di van Heft salanên buhurî de neqşeya pêr û mêzênin biserketin û jidestxistinê hatin guhertin, û bi piştevaniya hevalbendên Rêcîmê, Rûsiya, Iran û Hizb Allah, û hinek aliyên Sûrî ji Ereb û Kurdan, rêcîmê dikarîbûn careke din gelek herêman mîna Eleb, Homis, Dareya, Zebedanê têxe bin Kontrola xwe, û li aliyê din hîna gelek herêm hene di destê Rikaberiya çekdar de ne, mîna Deraa, Edlib, Hama û gundên derdora wan. Her weha hêzên Qesed (Hêzên Sûriya Demuqrat) ku ew jî li ser rêcîmê tîn jimartin, bêtir ji 24% ji xaka Sûrî dibin kontrola wan de ye, piştî windakirine Efrînê, bi tayîbet Parêzgeha Reqa û Hîsiçe anku herêmên Kurdî, ku hêdî hêdî ew herêm jî êdî vedgerin hembêza rêcîmê. **Ronahiya dawîya Şikeftê** Piştî Heft salan ji temenê şûreşê mirov dikare bêje ku hetanî vê kêlîkê tu ronahî ji dawîya şikeftê xuyanakê, û roj bi roj rewş dijwartir dibe, anku mirov dikare di dema nuha de rewşê bi çend xalan bîne ziman: Yê ku her tişt ji dest da û dibin barê qurbanîyan de piştî wî şikest milletê Sûrî bû, bi hemî pêkhatên xwe ve. Jimara birîndar û kuştiyan nîv Melyon 500 000 Hezar derbas kir

1. Jimara koçber û penaberan pê n Melyon 5000 000 derbas kirine
2. Bi Hezaran çarenûsa wan windaye û bê ser û şop in.
3. Bi Hezaran di girtîgeh û zindanên rêcîmê de ne.
4. Bi Dehan gund û bajarên Sûrî hatin wêran kirin.
5. Di tevaya cyografiya Sûrî de ewlekarî nemaye.
6. Civata Sûrî bi tevahî jihevket û kînen mezin ketin nav pêkhatên sûrî.
7. Rikaberiya Sûrî bi herdu aliyên xwe yên Siyasî û Leşkerî ve têkçû.
8. Iradeya navnetewî têkçû, û nikarîbûn li ser qadê tu biserkeftinan ji milletê Sûrî re bi destxînin her weha nikarîbûn hêminiya navnetewî biparêzin.
9. Kurd bûne 5 parçe. Ê doza xwe di vê serdemê de ji dest dan.
  - a. Encumena niştimanî kurdî li Sûrî
  - b. PYD (xweseriya demokratîk)
  - c. Partiyên Kurdî yên ku di bingeha xwe de bi projeya PYD ve girêdayî ne.
  - d. Partiyên Kurdî yên din yên ku bê hêz in û di serê hemî dîlanan de ne.
  - e. Çîna Rewşenbîr, Nivîskar, Siyasetmedar û saziyên sivîl yên serbixwe di nav vê qerqêşûn û şêlûbêliyê de





(3)

f. dengê wan windabû.

10. Gelek Welatan berê xwe ji şûreşê guhertin û helwesta xwe 160% pileyî zîvirandin.

11. Welatên ku alîkariya mewdanî bi Rikaberiye re dikirin, ew alîkarî rawestandin û berê Rikaberiye ajotin bazarên xwe kirin û firotinê.

### Destdirêjiya Dewletên hevsînor û têkildar

Iran: Em ê bi hemî hêza xwe hebûna xwe ya leşkerî di Sûrya de biparêz in, û me peymanên leşkerî demdirêj bi Şam ê re imze kirine. Sedemên destdirêjiya Iranê di Sûrî de ev in:

- 1- Parastina karîdorê bejî ji Iranê heta bi Libnan, ji ber vê yekê dixwaze dest deyne ser Sînorên Sûrî yên bi Iraq ê re ku ew jî du karîdorên sînorî ne: Karîdorê Albokamal û Karîdorê Alyehrubîya (Tilkoçer).
- 2- Iran dixwaze desthilatdarî û Şahinşahiya xwe ya Şî,î Farisî vegeîne, îro jî ev yek di riya hevalbendên wê (Rêcîma Sûrî, Hizib Allah, û Şepola Şî,î li Iraqê) tê pêkanîn.
- 3- Hebûn û bihêzbûna Iranê di Sûrî de, hebûna wê di Libnan û Iraqê de misoger dike.
- 4- Îran bi destdirêjiya xwe di Sûrî, Libnan, Iraq, Yemen û Behrên de, li himber berbelavbûn û bihêzbûna projeya Sinîkirina van welatan radiwest e.

**Tikiya:** Hêminî û ne hêminî û hebûna xwe di Sûrî de bi Sê (3) tiştan ve girê dide:

- 1- Behaneya şerê PKK ê û xwedêgiravî jiortêhilanîna vê rêxistina têroristiyane.
- 2- Parastina ewlekariya netewî
- 3- Tirkiya li gel Rûsiya û Iranê yek ji hilgir û rêvebira Danûstandinên Asîtana bû, ku di 04.05.2017 an de „Peymana Agirbest“ ê bi hev re imze kirin.

**Rûsiya:** Berî her tiştî divê em jibîr nekin ku Sûrya hîna de dema Hafîz Al Assad de ya Rûsa bû û sedemên hebûna wê di Sûrî de ev in:

- 1- Parastina berjewendiyên xwe yên leşkerî û aborî.
- 2- Piştî ku Stêra Rûsa rîjiya û di gelek ciyan de têkçû û nema kesekî di qada navnetewî de pakiyê pê dike, xwest careke din ji cîhanê re bide xuyakirin ku ew Hêzeke mezin e û kesek nikare wê piştguh bike.
- 3- Ji şerê Evxanistan ê û Şîşan ve tîrsa girûpên Islamî yên tundrew ketiye dilê Rûsa, ji ber vê yekê Rûsiya dixwaze evan grûpên Islamî yên tundrew li Sûrî tune bike.
- 4- Rûsiya weku gelek welatan û ji demeke dirêj ve di bin Kirîzên Aborî de dinale, û bi vê destdirêjahiya xwe di Sûrî de rewşa welatê xwe ya aborî baştir kir.

**Siûdiya Erebi û Qeter:** dibe ku xwendevan matmayî bimînin çima min ev herdu welat bi hev re nivîsandin.

Ez van herdu „Welat“ an ji layekî ve wek du Sêwiyên Emerîkiyan dibînim, û ji layekî din ve wek Pezmişkê ne ji Emerîka re.

Eger îro Emerîka destê xwe yê parastinê ji ser van herdu welatan rake, wê di nava 24 demjimêran de biherivin û kevir li ser kevir nasekine.

Emrîka hebûna xwe ya leşkerî di Rojhilata navîn de ji van herdu welatan fînanze dike. Ê sedema bingehîn ji destdirêjiya Siûdiya Erebi di Sûrî de ew e ku:

- 1- Emerîka dixwaze Siûdiya Erebi wek serperişta şepola Sinî li himber Iranê bide bikaranîn.

Bêguman Erdogan jî wek Xelîfe xwe di Cîhana Erebi û Islmaî de dide pêşê û Misilman jî vê yekê bawer dikin, û ji kêmtaqetî û ji tîrsê Iranê Siûdiyê jî piştî xwe ji Erdogan re nizim dike.





Emer isma'îl

## Kurd li Sûriyê ber bi çi qunaxê ve diçin

Wekû dîyare Piştî derbasbûna heşt salan li ser şerê nav xweyî li Sûriyê û raperîna gelê Sûriya ku li dijî rejîmê encam da û dirêjbûna wê , derdora 450 hezar welatî şehîd ketine û bi sed hezaran welatî hatine girtin û bi milyonan jî, li welatên derdora Sûriyê û Ewropayê bûne koçber û penaber. bidirejbona heşt salan gelek tişt ronî bûn nexasim piştî guhertina şoreşê de

ji şoreşek aştiyane bo şoreşek çekdar, û karanîna rijêm ê hêzên çekdar bizanebûn kirin di xizmeta berjewendiyên xweda û çarenivîsa Kurdan piştî vê şoreşê ber bi wîndakin û tinebûnê ve bir û rewşa kurdan dipaşeroja Sûriyê de ne dîyare Jiber ku ev grûpên çekdar ku bi biryara muxaberatên rejîmê hatibûn damezrandin derketin holê û taybetî hêzên çekdar yên p y d, da ku mafê kurdan bin pê bikin û her wisa rêya pîroz ya şoreşê bi guhertin bidin, dema ku şoreş bû çekdar helbet rejîma Esed ev yek pêk anî û wî hişt ku gelê Sûriyê çek hilgire ji ber ku sitemkariya wî zêdetir bû ta ghişte astê komkujiyan derheqê gelê Sûriyê de pêk werne. Û bitaybetî gelê kurd û lê rewşa Sûriyê ber bi qunaxekî gelek zehmet va diçe lê piwste tevger azadî xwaza Sûriya baş kar bike biyk rêzên xwe û bi armanca gel ta serkeftin bê bidestxistin jiber Nêzîk wê rewşa Sûriyê bê guhertin ji ber ku biryar ne di destê rejîmê û dovelankên wê de ye û tenê girêdayî bi biryarên navdewletî ne, û her wiha rewşa Kurdan dê piştî roxandina rijêm ê û hêzên biser rijêmêva wê birroxin û qonaxa siyasî wê gelekî baştir bê jiber hevpişkên me yên siyasî doza Kurdî wekû dozekê neditîtin, Kurdan dixwestin ku mavê kurdan bi destûra pêşeroja Sûriyê bi nivîsandin di amadebûna dewletên ji hanî û di serê wan de Amrîka , lê diyar bû birayên me dixwestin di berjewendiyên navdewletî û herêmî de bilîzin ne li gurî xwestekên dewletê xwedî bandor , helbet xema herêmî li bal wan hebû û tevî berjewendiyên hin dewletan bûn bi sedema berjewendiyên xwe. Di baweriya min de tu şîrîk nînin ji bilî Kurdan ku Amerîka û welatên Rojava ji wan razî bin. nexasim weve heşt sal bi ser Şoreş ku niha berû sala pêncemîn ve diçe, tenê dibînim şoreşa xwînê ye û bawer dikin ku bi xwînê jî ev şoreşê derbas dibe tevî ku hêzên n navdewletî berê xwe didin çareseriya siyasî, çareseriya siyasî dawiya şoreşa me ye, û bi vê yekê dê rejîma xwînmij bê herifandin û dê Kurd cihê xwe di pašeroja Sûriyê de bigrin, doza Kurdan dozeke siyasî ye ji ber vê yekê, qunaxa veguhêz girêdaye bi roxandina rijêm ê û duvelankên wê bi biryarek nav dewletî û şanda Kurdî ya ser bixwe mavê kurdan yê netewî di destûra pêşeroja Sûriyeyê binivîse û diyar bike.



Mehmûd Osmo

## Rewşenbîrên kurd

Ne tenê bi dev û lêv karê zanistî, Ramanî, sîyasî, civakî divê, raste daxwaz û armanca hemû Rewşenbîrên kurda welata- perwere û parêze, tev dixwazin û dibasin bo kurdistanek Azad û Serbixwe hebe. Ji bo van armancan bi lêv û ziman tenê nabe û çênabe, lê bi vînek hêz û xurt, dilêriyek di karda wê bibe rast û li ser qadê bi cî werê. Ji ber rewşenbîr astûna nifrûka pişt mirova ye û rola herî serke di navbera rewşa gel û welat de bi karbîne hwd. Rê çiqas dûrbe û wêneya jînê reşbe rewşenbîr rê nîzîk dike û wêne jî zelal dibe. Eger Ji nexweşiyê derûnî û ez ezî dûrbikeve û Ji tistên belûq û keysebazî jî berde di wê demê de kar û xebat cihê xwe bigre û hêsantir dibe . Encamên kar jî wê baş were xwiyan û rewşa gelê kurd wê xweştir be. Gelo berî her tiştî ka em her rewşenbîrek Ji xwe bipirsîn em kîne û çî rol Ji me divê çawa mirovan û kysen avakin. Lê hema bêjim ez xwedî Raman û çandim hwd. Sûde jî Ji

min nîne lê bê goman wêneyê xwe di çarçova xim û navdarbim Ji wê û pêve bê xeme Rola Ji me tê xwastin lîstik û derewe. Lê rastbûn û dilêri ye . Lê hema her yek Ji me bipeyve sed derd û şaşîti Ji me wê derkev û heger bi rastî em li ser jîna Rewşenbîran rawestîn sedema yekemîn di her nexweşiyê di nav gelê kurda ye çima? Ji ber Rewşenbîrên kurd Ji zimanê xwe dûrin û ti nîrxê nadê zimanê xwe di xwendinê û nivîsandinê gelek Ji wan alavên xwe bi zinanê erebî Yan bi turkî Yan bi farisî diweşînin bi rastî tiştek bêhamba û kêmasîkek herî mezine di jîna rewşenbîran de. Eger daxwaz û armanca Ne bi kurdî be karê te tev bi erebî çêdibe Ji dîrok û kultûr Ji bêhna kurda dûrdikeve tu namîne mirovekî kurd ,ka em bêjin rewşenbîr di ramê KU çawa xwe rêzgarbike lê na? Ez bawerim zû zû nikarê xwe rêzgarke ji ber ewna dûrim ji derd û bûyerên kurda min dixwast kom civatek di gel rewşenbîran de hebe ji ber axaftin xweş û baş bibe,raste piraniya wan ez nasnakim lê kar û alavên wan dişopînim Gelek ji wan ketine bin bandorek giran bi zimanê dagîrkerên welat ketine, ev rewşa wê berdewambe eger rewşenbîr li kultûra û çanda kurdî venegere û bi zimanek resen nenivîsîne û îro berî sibehê însîyatîfa xwe bi karbîne û dest bi bi karê xwe di wan babetan bike. Ev kêmasiya pir mezine ji ber windabûna miletan li cîhanê Ne cenge û ne jî cînosayde, windabûnê zimanê zikmakî Ne partî tenê di sûcdarê daye ev sûca di istûbarê rewşenbîran daye jî bi dilek xemsarî û tembel ew lê mêzedikin ne ji dil û Canê xwe bi kartînin Divê cînav û wicdan hebe ba her kurdekî perwere. Rewşenbîr û xwendevan dixwaze bi lezgînî navdarbe û rola girîng nake ji ber ew dixweze ji gel cizmeta wî bike, dixwaze gel ji wî ra tep û silavê lêbide û jê re biçepika de vê tu karî bike ji bo pêşxistina gelê xwe be (wek dibêjine ezê bi hişê û serê te mezin çibikim eger tu nebî piştvanê gelê kurda ), heger tu dixwazê ba gelê xwe mezinbê Cihê rêz û hurmetbê bê û wergerê wan bistîne tê alavê xwe bi kurdî çapbike û biweşîne Ji ber avabûna welat zimane dîroke kultûre wêjeye floklora ew jî ol peresta kurdaye hwd Xwe naske tu astûna bingeha partiya kurda ye û komela çandî û zanîngega û amojkeha û tu balyoza welate li seranserî cînavê bi çavekî çûk li xwe mêzeneke Vaye şikesbîr û tişîxof û kalîxo ..... hwd Ji kurda jî feqê teyrana Ehmedê xanî Pîra merd hwd Bila tu jî bibe nimûnek ji nimûnên cîhanê Ne yek ji aliyên nekokîbe mîna mirovê rûniştî di hembêza dijmin wek di bêjin xiyant ne ya teye ey rewşenbîr Rabe serxwe wekî jîr Tu nimûnê welate ey mîr Rewşenbîr pênûs û lînûs dagîr Gel li benda teye rêzgarke ji nîr Ez di baweriyê we dame hûnê rolekî paqij û netewe bikin, welat roj bi roj nîzîk dibe ji serxwebûnê xwe jêre amadekin Xwendevan Karê te xwendine,ne gotinên xar Rola te girînge,amadebe her car Biweşîne zanîne li her cî û war Şagirt li benda ew xortên pêşedar Fêrbike ziman û dîroka kevnar Berî zayîne kotî -zar û salar Di hindê mala key kawîs bom beşdar Bom mîvanê xisro bi mertal û şar Dakeve nav baban û mîtan bi kar Bingeha min hatî ji damarên dar Derketim ji çiya û lat û zinar Şêx se'îd û riza û gazî,zanyar Li hêla barzan bom pêşmerge çekdar Doza welat bo xem ji min re bi bar Rûtke kurên sehên har û sextekar Babil û pêncî din pişt me anî xar Firoto bi erzan,dan şî'a û sinê gemar Kerkûk û xaneqîn û şengal,jîn bo jar Kurê qehban bexda û tehran,sitemkar Hîro û qasimî dîv baban mîna mar Ey xwendevan pînûs û pel û çekdar Hêviya gel li teye bike şiyar Bi xwendin û zanîn rêça kurdevar Bernedîn şîreta barzan serdar Jîna rûmet bo welat can fîdekar Welat avakin berxudan,xebat û kar Welat û gel li benda weye Fêrbe zimanê zikmakî û fêrbike şagirtên kurdî bi zimanê kurmancî, soranî Zazakî kelhorî, lorî Tev ziravên kurdî ne Welatê me jî kurdistan e.



## Doza welat bû xem ji min re

Hişyar Emerê Lalê

Barzan bom pêşmerge çekdar doza welat bo xem ji min re bi bar Rûtke kurên sehên har û sextekar Babil û pêncî din piştta me anî xar Firoto bi erzan, dan şî'a û sinê gemar Kerkûk û xaneqîn û şengal, jîn bo jar Kurê qehban bexda û tehran, sitemkar Hîro û qasimî dûv baban mîna mar Ey xwendevan pînûs û pel û çekdar Hêviya gel li teye bike şiyar Bi xwendin û zanîn rêça kurdewar Bernedin şîreta barzan serdar Jîna rûmet bo welat can fîdekar Welat avakin berxudan, xebat û kar Welat û gel li benda weye Fêrbe zimanê zikmakî û fêrbike şagirtên kurdî bi zimanê kurmancî, soranî Zazakî kelhorî, lorî Tev ziravên kurdî ne Welatê me jî kurdîstane Di hemî pêşketin û serkeftinên ku îro roj di cîhanê çêdibin pêşketinên hiş û ramanê azadin ji ber ku azadî pêşketine ,guhertine û serkeftine çêdikê Ta em bibin xudan dewletjî lê ger em di hiş û ramanên xwe de ne azad û rizgarkirbin emê herdem êşa koletiyê bikşînin û emê nekarbin şaşîtiya ji nav xwe rakin emê bimînin êsîrê eydiyolociyên sereborî ,weke tiştta îro di welatê mede çêdibê. Ma nakokî heta kenkî emê kengî aqilkî ji xwere bigrin ... emê heta kengî parçebin û lawazbin ...em ketine kula xwe nakokiyên me hiştiye doza me ya bingehînî ji bîrbibê ....doza me biye kî wê bikevê di filan komîtê de û kiyê herê filan kongirî Kî wê seroktiya vî wefdî bikê partîti .û kî ...û kî...di welat de kes nema mîletê me bardikê ...bazdidê ..zarokê xwe direvînê...şepirzedibin.. penaber dibin..çavnimzdibin hê em ketine kîrrê hevdo ...welatê me tê firotin di bazargehên cîhanêde...û em hê hevdu qebûl nakin em birayê hevdone em dibêjin emê bibin şîrîkê hevdo????? .ev verêza he nika vê qûnaxê bi rêve bibê dem dema yekîtiyaye ne dema nakokiyaye dijminê kurda ne li hevîn lê li ser kurda hemî yekin û bê nakokîne lê li hember vê yekê mixabin em kurd hê di van nakokiyade dijîn Ci mirov yan jê civak heta rizgarbibê ji rewîşt û tîtalên berê divê wêrebê û zîrebê di hiş û ramanên xwede ,divê bikarê şoreşek guhertinê di mejiyê xwe û civaka xwe de li dar bixê ta em bibin pêşketî.....





Ji tomarên dîrokê

**Husnî Elze'îm**

## derbeya yekemîn a li Sûriyê

Ew di 1889an de ji malbata dînî ya olî ya Helebê bû, li bavê wî Muftî yê Osmaniyan bû û birayê wî Salahedîn Şêx bû. Ew di dibistana leşkerî û fransî de hîn dikir. Ew ji aliyê Şerê Cîhanê ve hat dîl kirtin. Piştê ew di 1945-ê de darizand û zehf bû, serokê rahdarê û fermandarê fermandar hat avakirin. Club Paşa, fermandarê artêşa Urdunê ku dişibe serê çeteyên Şîkaxo Mirî e ku cara yekem ji bo hilgirtin daran mareşal ji serê dewletên erebî zewicî û li pişt a keçek tenê jêre çêbû û ew ne pere û ne mal jêre tiştêk nehiştibû. Li ser 30 Adar 1949 de, pêşî

derbeya li Sûriyê û Xalid Elazim Serokwezîrê tevlêkirina Şîkrî Quwetlî, Serokê di girtîgehê de û piştê ji wan re serbest hatin berdan, û dema ku ew hatiye çêkirin ji bo xwarinê bi wan re bû, derbeya jî ne up xala spî xwîn. Dr. Mohsin berazî serokwezîr Fecall hat tayînkirin û hewl avabûye ji bo reformên cidî rêveberî û aborî de, û wek ku di nêzîk de dest pê kir ji bo baştirkirina peywendî bi Misrêre serdana bi dizî bi Qiral Farûqî re hevdiştin kir û ji aliyê King Abdul Aziz, herweha Nûrî al-Said Ew jî piştgiriya partiya Baas a Akram Houranî bû û mamoste Anton Saadeh, ku ji Lubnanê heta Sûriyê ve hatibû piştevanîkirin û ew xilas kir ku ew serkeftî baş bû, lê di bin zextên hinek serokkomar ereb, bi taybetî bi Nûrî Said Said Antoine Saadah da ku desthilatdarên Libnanî dane, Xwe. Li ser desthilatdariya kurd li ser desthilatdariya xwe ya kurt bû ku bi tenê 137 rojan hebû: Hêzên Serokwezîr Mohsen Barazi û kolonel Mahmûd Shawkat, ku wî ji wan re şîret kirin da ku ew ji cerdevaniyê ji Jirkên xwe re biguherînin û bi alîgirê serokwezîrê Îbrahîm re piştgiriya xwe guhertin. Huseyini, serokê polîsê wî, ji bilî hin karbidestên kurd ên ciwan ciwan. Sedema ji bo mirina Anton Sa'ad ji bo serokatiya Husnî el-Zeyyem, pirsgirêkek e ku ew ji bo bersiva xwe an pereyê xwe nekiriye, ji ber ku neheq û pereyê xezeb bûye, û şahidê wî diyar kir ku ew şermezar kir û dema ku ew ji mirina Anton Sa'ad bihîst. Û destpêkirina bûyerên li dijî dora duyem li Sûriyê, ku ji aliyê dijminê Libyanî ve hatibû rêberî Husni al-Zaim, Samî El-Henawi di 14ê tebaxa, 1949ê de û 3.15 di 3.15 de serokkomar Husni hate rêber kirin. Û serokwezîrê Mohsin berazî, lê hakem ew ji bo Sami Hinawi, ku derbeya, ya sêyemîn Hinawi Beyrûdê û pismamê piştê Mohsin Fecall hero Hrjo reviyar tola Mohsin dikim taxa Beyrûdê, 31 November, 1950 hilda dewam nekir, min jê pirsî kanala televîzyona El-Cezîre, birêz Hrjo çawa kuştin Sami Hinawi? Wî got: min dît, ji ser avahiyê bi lez were Vnadetth, Sami Beck gun min bû û dema ku ew zivirî pêşkêşkara Cîgir bo telefîzyona hate gulebarankirin û ji wî re got: Çima Nadetth? Hrjo got: Em tu kesî ji kurdan li pişt kuştina ne û dibînin ku ew tirsonek in, û gava ku ew Serokê Celal Telebanî Hrjo li Amerîkayê serdana wî pirsî, piştî mirina wî Hrjo li Kurdistanê bi girseyî bîn definkirin û darvekirin daxwaza wî. Hîro Hrjo elberazî, li Kurdistanê di hero Mela Mistefa Barzanî goristanê hate definkirin.





## Rêxistina Aşûrî ya Demokrat Sûcdariya Beryara rêveberi xweser dike

Ku dibistanên suryaniya bigirin, daxuyaniya li ser girtina rêveberiya xweser ya dibistanên siryaniya li cezîrê Roja Sêşemê -7-8 2018 an de, di warê destaya Perwerdehiyê û desthilatdariya rastîn (Rêveberiya xweseriya demokrasi) nameyek bo rêveberiya taybet a dibistana Suryanî ya Derek (Malikiya) nivîsand, ew hişyar kir ko dibistanê wan bîn girtin

her zêdî 24 kajmêran de Di bin pirsê qanûnî de Li ser bingeha ku dibistan ne lîsansa ne Di nav dema qanûnî de û bînpêkirina mercên qanûnê , yên ku ji hêla Komîsyonê ve nayê veguherandin, li dijî Komîsyona a bingehîn ya ku heta dawîya dibistanê dibîne qebûl dîkin. Ji rêza Seretayî ta Rêza sêyemîn Pêwîsteya Perwerdehiyê ji bo dibistana Suryanîyên taybetî ya li bajarê darbasiya taybet jî heman hişyariyê belav kir, Gefe kir ku ew jî dibistanê wan bigirin Dibistanên taybet ên li Cezîrê û Sûrîyê ji 1935ê ve ji dewleta Sûrîyê re lîsans û xwendekarên fermî hîn dike Her weha çend kursên ku zimanê ziravî ji zimanê ziravî ve hîn dîkin û xwendekaran ji hemî beşên (ereb, kurd û din) û xwendekarên Aşûrî yên Sûrîyeyê qebûl dîkin. Vê lîsans ji van dibistanan vekişandin û biryareke biryara Baathê ya paşîn di salên Şêstîde hate girtin. Piştî çend salan, ev biryara êşkence bû û hînkirina veguhestinê. Em di Rêxistina Aşûrî ya demokratîk de bi Em biryara xwezayî ya xwezayî tawanbar û sûc dar dîkin Ya ji belî desthilata rêveberiya xweserê , û em bawer dîkin ku ew kurên Aşûrî Sûryanî armanc dîkin û li ser wan zordariyê bigirin, Ev yek bi lîstîna li banî tê bi vê rêveberiyê de li ser yekîtiya welêt de, wek ku li dijî îdîayên demokratîk ku xwe re rêzgirtin derve di navenda wan (perwerdehiya demokratîk), û tekez dike ku ew hazirkin û kêmkurt dîtiniyekê de, û di xizmeta pêvajoya lîdana yên din jî di pêvajoya perwerdehiyê de, bêpar Xwendekarên ji hemû pêkhatên berde wama xebatê de, di esasa helwestên îdeolojîk taybetî ew heta ew ên ku û serperîştkarên îqna ne. Li gorî vê, em ji bo desthilatiyê self-management bang destê referansa di cih de vê biryarê, û rê vekirina dibistanên Suryanî di Derek Dirbêsiyê û xwendekarên direct xwest ku qeyd hemû pêkhatên berî destpêkirina yên vê sala dibistanê nû.

Sûrî 9/8/2018

Rêxistina Aşûrî ya Demokrat

Nîvîsgeha Siyasî




## Demokratî" û "Yekîtiyê"

Li Bexdayê ku bijartina hilbijartina xweş bike Heyetek her du partiyên sereke di herêma Kurdistanê de di nav bajêr Bexdayê de bi rayedarên siyasî re hevdîtin û li damezirandina hikûmeta nû ya din. Di encama hevdîtinê de bi hevdîtinek got ku hevdîtina du partiyan piştî ku ew hat ba xwe Fuud Masum bi hevdîtinê re rûniştin. Serokê şanda Demokrat, Fadel Mirani, serokê şandeya Yekîtiya Niştimanî Mela Baxtiyar e. Heyetek du poles digerin ku ji bo hilbijêrin ku ji bloka herî mezin çêbikin. Û nikarin destûra polîtîk bikin ku peyman sereke ya avakirina herî mezin ya pêşîn, gava pêngavên ku di welêt nû de hikûmetê nû çêbikin.



Sadiya Ibrahim

Rêxistina jina kurdî ya azad ahingek bi boneya çejna Qurbanê ji bo zarokan li dar xist li bajarê Qamişlo bi amedebûna zêdî sed zarokî û bi amedekariya hinrmend Beha Şêxo û zarokek biçûk bi navê amed di vê der bariyê de endama rêveberiya rêxistinê Sidiya Ibrahim nerîna xwe da û got Ji bo şahiyê û kêf xweşiyê em têxin dilê zarokan de û wan dûrî xemgînyê xînin Em di Rêxistina Jina kurdî ya Azad de ahingek me lidar xist ji bo em dilê zarokan xweşbikin ji ber ku cejnên me bi xemgînî di ser wan re dibûrin ji ber koçberiyê û valabûna bajar ji xelkên wê .û bandora van tiştan giraniyek bû li ser jiyana wan , ji ber vê yekê me daxwaz kir ku em şahiyekê ji bo zarokan çêkin û tevî beşdariya hunermend Baha Şêxo û amadebûnadeng bêjê bi çûk îmad û diyariyên sembolîkî me pêşkêş kir ta ken herdem li ser riwên wan bimîne



## Kurd li Sûdanê

Û hejmarên herî girîng ên kurd hene û parêzgeha Kurdofan, herêmek kurdî ya pak e. Dîroka gihîştina Kurdên Sûdanê vegeriyên 800 sal berê û bi t aybetî di 1172 de bi kampanyaya Selahedîn el eyûbî, ku birayê wî Turan Şah bû, li dijî Fatimiyê Misrê şerkir û zoriya wan birbû lê hevalbendên Fatimîd

Nubiyan, rabûn dest bi bevçûnê û tengehayê kiribûn da ku Turan Şah serokê leşkerî piranî Kurd bû û li dijî Nubiyan sekinîn. Di encamê de Sûdanê û dawîya pirsgirêkan hebû, û paşê kampanyaya Turan Şah Sudanê derket, lê paşê gelek şagirtên wê yê artêşa wî ji bo ewlehiya rewşa ewlehiyê biparêze da ku ne pirsgirêkên Nubiyan re dîsa bisekinin û welatekî din ji bo Sûdanê dagirker, Rêberê Sûdanê Îbrahîm Kurdi, ku di dema sobelanê de di nav avê de di fetisî, ji wê demê de ta îro gelek kesên navê kurdî li wanin li Sûdanê dimîn û hîn ew gelek celebên taybet ên xelkê hebûn, heta ku rengê wan "Asmarin". Gava ku tu li welatê Siûdanê de ne li ser welatê wî welatî, ew ê ji we re dibêjin ku ew ji eşîra kurd e, ji bo ku ji bo cesar û hêrsîna wan tê naskirin û ne ji bo parastina rastê bêdeng bimînin, mêvan û pesnê wan li bajaran dijîn dikin. Di dema dagirkeriya Sûdanê de, tevgera Mahdi belav kir, li seranserê welêt belav bû û li dijî pêşberiya Brîtanî bû, tevgera her du rêberan, yek li rojhilatê û din li rojava bû, ermandarê li Sudan li Rojhilata Navîn Osman Dîfne bû. "Gava ku tu li welatê Sudûdî li ser welatê wî welatî, ew ê ji we re dibêjin ku ew ji eşîra kurd e, ji bo cesar û hêrsîna wan tê naskirin û ne ji bo parastina rastê bêdeng bimînin, mêvan û pesnê wan li bajaran dijîn dikin. Û fermanarê yekem bû ku di dîroka Sudanê de Brîtanya têk bibin, û niha planek leşkerî ji hêla artêşên Brîtanî ve hate damezrandin, ji hêla artêşa Brîtanî yê Brîtanî ve hatibû veguhestin, paşê girtina leşkerî Brîtanî û zîndanê zindî bû, û 17 sal cezayê girtîgehan bimîne. Di zîndanê de. "Wî jê pirsî Brîtanya di dema darizandina wî de, ji bo veşartina şoreş û serbixwebûna leşkerî, wî ji wan re got ku ew Kurd û bajarê wî bû Li Diyarbekirê, û li pirtûkek li ser Sûdanê ya sereke ya Sudan di heman demê de pirtûkek heye ku li Osman Kurdi, ku di 1517 de mir miriye, û fermanar ev bû, ku di artêşa Sudanese de, wekî tîm Ali Ali Mihemed Kurdi, karbidestên herî mezin yê Karûbarê Parastina Parastina Duyemîn, Îro, gelek kurd hene hene ku li ser mîrasiya xwe bistînin...



# SAMANÊN NETEWÎ

Encûmen dîrok: 5-9-2018

(11)

jmar (6)



Ihsan Nûrî Başa

1893 -1976



Bi Pênûsa

Qasim Mer'îka



Nûredîn Zaza

1920 – 1988

Li Bedlîsê hatiye dinyayê. Xwendina xwe ya destpêkê li Bedlîsê kir. Pêşî, Ruştîyeya Leşkerî ya Erzinganê, paşê dibistana herbê (Cengê) ya li Stenbolê xwend û bû serbaz. Di şerê Yekemîn ya Cîhanê de li gelek eniyan beşdarê şer bû. Di dema şer de, kete nava xebata Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê û bû sekreterê Cemiyetê. Piştî ku ji bo çareserîya kêşeya Kurd bi endamên Artêşa Sor re kete nava hevdiîtan, bi mebesta rêxistinkirina Komên welatperwer ên Kurd, ji ser Îranêvegeriya Sarîqamîşê. Ji ber vê sedemê, li Dîwana Herbê tê darizandin. Ji bo ku fealiyeta wî nayê peyîtandin, beraet dike. Li dijî sirgûn û qirkirina Ermenîyan derdikeve. Di pêvajoya avabûna Komara Tirkiyeyê de, dibîne ku sozên bo Kurdan hatine dayîn pêk nayên. Lewre jî dikeve nava "Cemiyeta Azadî" . wekî endamê Cemiyetê, yekîneya leşkerî ya li Beytuşebabê ku li wê derê wezîfedare, bo serhildanê amade dike. Ji ber şaş tê gotina bruskeyekê, dest bi serhildanê dike û serhildan têk diçe. Piştî vê bûyerê derbasî Kurdistanê Suriyeyê dibe. Dema ku serhildana Şêx Seîd dest pê dike, li Îranê ye û tê girtin. Di sala 1927an de, bi biryara "Xoybûnê" Serhildana Agiriyê bi rê ve dibe. Di hevdîtinên bi Hikûmeta Tirk re de. Mohra xwe li bin peymanê, bi belavokekê careke din serhildanê da destpêkirin. Serhildan, bi tundî hate vemirandin, neçar ma ku careke din biçe Îranê. Di dema Şerê Duyemîn ê Cîhanê de, bi hinceta ku dê careke din serî hilda, li Îranê careke din tê girtin. Di sala 1976an de, li Tehranê bi qezayeke trafîkî ya bi guman, jiyana xwe ji dest dide.....

Li Madena Elezîzê (Xarpêtê) hatiye dinyayê. Di dema zarokatiya xwe de, ligel birayê xwe Nazîf, piştî raperîna Şêx Seîd derbasî Sûriyeyê bû. Xwendina xwe li Şamê kir û ji bo pisporiyê şû Swîsreyê. Di dema xwendekariyê xwe de li Lozanê bi navê Komeleya "Xwendekarên Kurd" komeleyek avadîke û dest bi xebatên Siyasî û çandî dike. Paşê vedigere Sûriyeyê û ji bo derêxistina kovarên "Hawar" û "Ronahî" alîkariya Celadet dike, di van kovaran de dinivîse. Beşdarî li xebatên PDK-ya Sûriyeyê dike, peywiran werdigire. Ji ber van xebatên siyasî, li Sûriyê, Îraqê, Urdun û Lubnanê gelek caran tê girtin. Di sala 1969an de dîsa vedigere Lozanê û rojnameyan de dinivîse, beşdarî bernameyên televîzyonan dibe. Bi zimanê xwe nivîsand, ji bo pêşketina Kurdî gelek xebitî. Tevlî avakirina Enstîtuye Kurdî ya Parîsê bû, peywir wergirt. Mem û Zînê, destana Memê Alan bo Firanî wergerand. Jiyana xwe jî bi navê "Ma vie de Kurde" (Wekî Kurdek jiyana min) kir pirtûk û li Fransayê çap kir. Li Lozanê çû ser rehma Xwedê. Gora wî li Lozanê ye...

## Şemdîn û Hemdîn xeleka (4)



Luqman Silêman

beriya ku ew te bikujê heger ne îşev bê wê siba bê tu derba xwe lêxe beriya ku ew lit e xê.. dijmin û neyar sînor û hidûd bi meve ne hiştin e berxê bavê min o wî ji koza Behîca xatûnê bikşîne jêre bêje axa yê min o ez ji te mestirim lê bi mêranîyê ve tu ji min mêrastirî ez nikarin ling li pêşiya te bi dim ka rima dozde movikî di destê te deye di nava serê Hemdaniyê bi hejînê derbekî bavêjiyê li qolincê xîne berxê bavê min o deriyê bavê li mîratê bi gerî ne bila Zozanê jorî ji te bi tenê re bi mîn ê axa yê mino hêhêhê paşa yê min hey lolo hakimo hey lo xweşmêro hey lolo.. Hêhê axa yê min o dilê min delo dîne sibî dema ku tîrêjê rojê

tavêjin ji mala xwedê roja me derdikevê ji pişta çiyê ji mala Rebil Alemîne. Ehmed axa yê delo dîn li cotê xulama dike gazî cawaniya boz ji min re ji tewil xanî bîn in. xulam lezdiKin û di lezîn in Hemdaniyê jêre ji tewle xanê derdixîn in.. Ehmed axa bavê Şemdîn weka bazekî birçî xwe avête ser pişta Hemdaniyê û berê xwe da ber koza Behîce xatûnê jina Hisên axa axa yê delo dîn.. Ehmed li ber kozê sekinî û sê denga dîsa li Hisên axa yê delo dîn dikê qêrîne dibê derabe derabe beranê bavê min o derabe.. birê min o dilê min dilekê delo dîne ez bala xwe didimê sînorê me dîsa dijmin û neyarê me dîsa tê de danî ne û tu li kêleka Menîce xatûnê raketiye heyê te ji bayê felekê ti nîne qey çavê te lêye ku dijmin û neyarê me bîn bi gulî û dêmê keç û bûkê me bigrin û bûkê me ji himbêzê mede derxin û sê guliyê hinekirî dîsanê bûk û zava ji hundirê kona derîn in hey axa yê mino..? Dema ku dengê Ehmed axa yê delo dîn kete guhê Hisên axa.. axa yê delo dîn heyvanê aqil û sewdan di serê wîde namîne weka logikekî harbûyî çav li serî sor bûn weka dîna ji nav nivîna da xwe. Weka çêrekî birîndar ji ser birîne radibe birîne wî derdikevin ji nav ciya û badikê Mence xatûnê ka ji min re Hemdaniyê û cilê min ji min re bîne. Menîce xatûnê li bayê bezê qarçek û hespê Hemdanî ji tewilexanê derdixîne kom û koloz li nîve aniyê datîne şal û şapikê Botanî li xwe dişdîne radijê rima dozed movik û ji Ehmed axa re dibêje bira yê min de bajo bajo beranê bavê min ez bi tere ax lolo de bajo xweşmêro hakimo de **bajo lolo de bajo**.. Hêhê paşayê mino dilê min dilekî delo dîne her dû bira bi rêketin Eşîrê da dûv wan lê herdû bira li Elê zîvirîn ji wan re gotin lawo vegerin îşê we ji me nîne em herin ka bê ev kîne yê ku ketine sînorê me. Herdû bira bi kêleka hevdû ketine berê xwe dane welatê jorîn.. axa yê mino Ehmed axa badikê Hisên axa bavê Hemdîno birayê mino ez ji te mestirim bi emir tu qedir û marîfetê min digrê li ser serê min lê bi mêranîyê ez ji te ne mêtirim ji min zêdeye ku ez bidim pêşiya te dilê min dilekî delo dîne birayê min ez bi nav sala ketime û kevelê min tenik bûye tîrsa min ewe dema ku ez çav li neyara kevîm cegerê min bişkê û ez bi çûnde vegerim lê ez di zanim te gelekî şerê Şemera û Turka kiriye bi qesema navê xwedê heyvanê xofa insane di nava te de nîne çavê te ji wan naşkê de bajo berxê bavê mino hey ooo lolo birayê min bajo hakimo hey lolo de bajo.. Hêhê axa yê mino eva axa bi qunaxa sê şev û sê roja ji Zozanê jorî dûr dikevin Ehmed axa xwe hinekî ragirt ta ku Hisên da pêşiya wî li dora xwe meyzand devereke kere newaleka kûre ji xwedê pêve kes xuyanake ji xwe re got ev yamîne rahişte rima dozdeh mitro û di nava guhê Hemdaniyê re avête birayê xwe lê mirma wî li pêşiya Hisên axa.....

## Serpêhatiya kurê mîr

ji Foloklorê Kurdî

xeleka (1)

Hebû nebû xweşî li canê min û we bû,

tê gotin : ku li herêmekê ji herêmên kurdistanê hebû mîr, ew dihat jimartin ji qeralên setemkar û zordar li ser êla xwe, tiştêkî bê rê nedima ku wî dijî wan ne dikir, lê ên herî kirêt û bi gemar ku wî û peyayê malbata xwe destê xwe dirêjî namûsa wan belengaz û hejara dikirin, çî veşartî û çî eşkere. Ew mîrê setemkar xwedê kurek dayê, ew kur lê giha û di nav wan bûyeran de mezin bû, xortekî çeleng û mêrxas jê hate der, ev xortê çeleng xwest rojekê ji xwe re jinekê bixwaze, lê ew geriya û negeriya ti keçê bi dilê xwe di nav êla bavê xwe de nedîtin, ne ji ber sipehî, bedewî û xweşik bûna wan lê dilê wî ne dibijî wan bi sedema ku bavê wî û apanê wî destê xwe avêtibûn wan û haya wî ji çîrok û çîvanoka çê bûbû, ji ber vê ûştê nikarîbû tu kesî ji keçikê êlê ji xwe re hilbijêre. Xortê çeleng jî sînda asê xwar ku ew tu jina nayîne ger jê nebawerbe, divê keçekê bîne ku ew bi destê tu kesî neketibe, ne jî kes rojekê karibe aqilê wê ji rê bibî, di navbera xwe û giyanê xwe de digot:“ ez dê keçekê ser destê xwe perwerde bikim, bera bayê sar û germ lê nexe, bera dan û sitandina wê bi ti mexlûqî re nebe û nejî gotinê ti mirova bi serê xwe de bibî, ji bilî ên min, ger ez çî jê bixwazim ew teqeze bipejirîne û bike“ kurê mîr bi van ramanên xwe re dijî û her ew di vê armancê de dipûnijî, roj di pey rojê re derbas bûn , carekê derfetek jê re çê bû û derba wî li êlek cîran hat, êrîş bire ser, kes û malbatên êlê ji hev tert û belav kirin, ew talan kirin û cih û warên wan kire bin baskê xwe de, di wê bûyera mezin de zarokek keç ji ê wê êla talankirî ket destê wî, hîna wê zarokê buhara duwemîn neqedandibû. Kurê mîr qesrek li serê çiyakî ji ên wê hêlê ava kir û hawîr dorî wê kirin dar, bexçe û zevî , co û cobarên ava sar di ber re diherikîn. Ji êla bavê xwe veqetîya û di burca belek de rûnişt, ew keçika biçûk bi şîrê xezala û hungivê mêşên çiyayên kurdistanê xwedî kir û mezin kir, ta ew keç giha wek tak rehan wek şiva xeyzeran li ber sira bayê sibê dixelîye vî alî û wî alî, roj di pey rojê re wek gulekê geş bû, sal û demsal li hev dûbare bûn, wî keçik ser destê xwe bi hostayî û zanebûn perwerde kir, her û her di serê wê de xwend, ta amede bû û her mêrî ji xwedê dixwest ku ew jin jê re bibî bermalî. Li vir kurê mîr ev keç li xwe mehr kir û bû jina wî, demek dirêj bi hev re derbas kirin, çend mindal û cêlî ji wan bûn rêz, sê keç û lawek, lawê dawî bû di rêzê de, jiyaneke xweş bi hev re dibuhrandin, mal û mendal di burca belek de di nav gul û beybûna de di nav rehan û binefşê cur bi cur de, di nav şînkayî û fêkî de, ji sêva ta hinar û behîva, kaniyê ava sar dengê şalûl û tilûran bi awazên sirûştî dorpêç dikirin wek avayîkê ji ên buhiştê, haya wan ji bayê felekê tunebû, mîr jî diçû nêçîra teba û pezkovîyan, xezal û kewê çiyayê kurdistanê, jiyana rojane bi vî awayî diqedandin. Mîrê ji êla bavê veqetîyayî ew der ji xwe re kir cih û war, bû pêwanê wê û parast ji hemû êrîşên êlên din, nehişt kesek bi tobraxê milk û mewdanên wî bike loma navê wî bi mêrxasî di nav êla de belav bû.



# HELBEST

Encûmen

dîrok: 5-9-2018

(14)

jmar (6)

Şevbiwêrk

Narîn umer



Were Em şevbiwêrkên ber fireh raxînin  
hemî rahêjalên evîniyê lê bicivînin  
wekî evdalê Zeynê û Gula keş e  
Sê şev û sê rojan li pey hev êrîşa serxweş  
û mest vexwar em ê berdîn li ser lîsên xewa giran  
Pirek bê dawî em ê damezrînin  
di navbera çav û razanê de  
Hemî helbestên xweş û nexweş em ê birêsin  
Gava xunava zelal li ser eniya te bi çirîse  
ez ê ji te bixwazim Qulingeke çeng şikestî  
û hemî êş û janên xwe bi binalîna wî re em ê bilorînin  
mîna Evdal û tevî xwenerojên wî bibin di gemiya  
Dêrika rengîn de Ez ê sîbera te di dilê seqlanê de  
noq bikim û bavêjim himbêza Pira Fafid  
Bi wan birînên derman dayî  
ji rondikên min û te em ê zummêna kûr berdîn  
û hemî kulîlkên dil buhar  
bi leyizînin Çeqçeqa baskên Pirprîkan  
wê keserên me bi firînin û li  
hawîr dor gora Beko bi civînin  
Dema Qulingê dil birîndar  
derbasî laleşa pîroz bibe  
em ê kevirê bextdana xwe  
di agirdana wî de bi kolin û  
Peymana kirîvatiya saxlem Em ê bineqîşinin

Tengezar Marînî



Helbesteke serberdayî  
Bi xwîna helbestvan şuştî y  
laşekî rûs im  
bi qêrîna te destnimêj digrim  
Li nav xewnên te camek im ji tozê  
«çavê jinekê  
serî li zarokîniya xwe hilda  
«di spêdeyên zû de  
diranekî winda di şikeftên Rebanî de  
Li nîva şevê  
balgehekî ji sêva yî  
«xunafî  
.di nav piça heyvê de  
Serabî di bîranîna evînê de  
Helbesteke ji tozê yî  
«Tîpên min di pistepista cihan de  
.kuştin in, di erxebîlên giya de  
Bajar bi giriyê te disote, spêde li xêveta işqê ye  
ez keja peyvên di golên şînê de dicûm  
Ev şev e  
Desthilata helbestvan xewn e  
derya şevbuhêreke nivistî ye  
«Ev helbesta min e  
«serî li heyvê radike  
nexşeya pêla liber ava av dide  
Av heyranên te dibêje  
ez herêmên helbestê di çavên mendehoşiyê de  
.derbeder dikim  
«Di lerza te de  
simbila mirinê me  
«Tu ser burca dilê min nimêj dikî  
.ez revendgeha peyvê me  
Helbestvanekî  
aşiq im



**Azad Mustefa**

## ***Jinên azad***

***Em jinên Kurdistan in***

***Zane û xwendevan in***

***Xwişkên leyla qasim in***

***Ji xakê re bêrîvan in***

***Xwişkên şîva gerdî ne***

***Evîndarê azadiyê ne***

***Dektor û mamoste ne***

***Pêşketina welatê xwe ne***

***Dayîkên şehîda ne***

***Dermanê pirînan ne***

**( Qere çarşema bi xwîne)...**

Dîsa qêrîn û hewar

Û teqîna

Qere çarşema bi xwîne

Li Qamişloka evinê

Hewara dayîka bi şewat û şîne

Dîsa zik reşîya bê olî

Hat û çinî gulê bihara minî rengîne

Ax û sed ax lêdana

Ji xavil û pişde

Ra û derman jêre nîne

Kurdo şîyar be dijmin

Gurê dev bi xwîne

Ser serê me çima

Sefer berlik nû jîne

Rabe ji xewê

Gotina Xweda û Pixembera

Bêk bîne

Cima gelo wê Kurd bin destade

Bimîne

Hemi hêza bika yek

Wek volkana dinê bi hejîne

Ji qerwerka û gotinê ser

Tenûra dest vekşîne

Xwîna xorta qe ne sembole

Heya niha şerme

Ti bê al û hêz û welat

Nîne

Karta Çîhanê bi yek çar

Wê bêjin Kurd hene

U Kurd Arîne

Bi hemî Olê xwe

Û yek Xweda

Û serok Barzanî

Kurd dîroka cîhanê

.Dinivîsîne



**Dr. berzan Xalid**

# Helbestên Zarokan

Encûmen dîrok: 5-9-2018

(16)

jmar(6)

## Marşa tîpan


*Em şagirt in, em dixwînin A B C*  
*.Nivîsandin, ew ji me re armanc e*  
*Tîpên me tev sî û yek in, Ç D E*  
*.Xweşî ev e bi zimanê kurdmanc e*  
*Ê F G H him rehet e him şêrîn*  
*Î I J K xweş dixwînim bi qîrîn*  
*L M N O hê mayine hinên din*  
*.Gelî kurdan werin tev de bixwînin*  
*P Q R S Ş T Û U tu meyze*  
*V W X ne, ez şaş nakim yek levze*  
*.Heşt dengdêr in, heçî dengdar bîst û sê*  
*.Riya ronî dibistan e, ma Y Z*



*Hisênê Emîn*



# Encûmen vî karê kirêt şermezar dike



Na ji bo darvekirina Ramîn Hisên Panahî û hemû xortên kurd

Bi destê rêjîma îranê



**Bila hemû rêxistinên mafên mirovan bikeve**